 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*


# Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 17**

# Keştiya Tofanê û Çiyayên Kurdistanê di bermaya îslamî da

## Çîroka Tofanê ya qur'anî:

Çîroka *Tofanê* ya qur'anî di xêzên xwe yên gelemper da dişibihe çîroka *Tofanê* ya tewratî. Cudahî tenha di hin tiştên hûrik da heye. Şêwazê tewratî bêhtir ji raxistina bûyerên dîrokî va bi awayekî hûrik nêzîk dibe. Lê belê şêwazê qur'anî tenha xêzên gelemper (bûyerên sereke) tîne ziman û wan tenha wek pirekê bi kar tîne, ji bo balkişandin û şanîdana rê, ji bo kişandina daxwaza mirov bo xizmeta Xweda, û ji bo tirsandina mirov dema ji Xweda asê bibe.

Eve şêwazê gelemper derbarê raxistina çîroka *Tofanê* di Qur'anê da. Ew di bêhtirî şeş sûreyên qur'anî da hatiye xeberdan, û sûretek jî heye bi navê "**Sûreyê Nûh**" bi tertîba 71 di nav 114 sûreyên Qur'anê da bi giştî. Va ye kurtahiya agahdariyên ku di hemû gotûbêjan da hatine:

Gelê Nûh rêya xwe wenda kiribû û bûbûn pir-xwedawend; ji hin xwedayên din ra perestî dikirin. Xweda pêximber *Nûh* ji wan ra hinart daku ew dest ji rêwendabûnê berdin û vegerin guhdarkirina Xweda û ta'eta wî. *Nûh* gef li wan xwar ku asêbûna ji Xweda wê bibe sedem ku ew sezayekî giran bikişînin. Lê belê tenha beşekî biçûk ji gelê wî pê bawer kir. Dîsa jî *Nûh* di vexwendina gelê xwe da ji bo guhdarkirina Xweda berdewam kir, û ji wan ra pir nîşan û belge pêşkêş kirin. Rêberên gelê wî, ji wî xwastin ku bera wan çend kesên bi wî bawer kirine bide, û gotin heger tu bera van çend kesên rezîl bidî, emê bi te bawer bikin. Lê belê *Nûh* daxwaza wan nepejirand.

Sebir û hedana *Nûh* li ser gelê xwe bi dirêjahî da û her wan azar û ziyan digihande wî; qerf û tinaziyên xwe bi gotinên wî dikirin. Hîngê *Nûh* ji Xweda xwast ku koka wan bîne û kesekî ji wan nehêle. Xweda ew hêminand ku bila ew êş û azarê nekişîne, tikesên din wê bi wî bawer nekin, ji bilî ew çend kesên ku bawer kirine, û jêra got ku ewê wan bi *Tofanê* biqelîne û ji holê rake. Jê xwast ku ew keştiyekê di bin serpereştiya wî da durist bike. Dema *Nûh* keştî durist dikir, gelê wî di ber wî ra derbas dibû, qerf û tinaziyên xwe pê dikirin. Lê belê wî guh nedida tinaziyên wan û her di duristkirina keştiyê da berdewam dikir. Gava *Tofanê* destpêkir, kaniyên avê der bûn û baranê bi xurtî lêkir, Xweda ji *Nûh* xwast ku malbata xwe têxe keştiyê û pêra ji her jîndarekî cotek (yek nêr û yek mê). *Nûh* wisa kir û lawekî ji lawên wî nexwast ku bi wan ra li keştiyê siwar bibe. Wî got, ewê here ser kopê çiyayekî bilind daku ji *Tofanê* rizgar bibe.

Asta avê bilind bû û pêlên avê bûn wek çiyan. Keştî tev kesên ku têda bûn bi rêket û lawê *Nûh* tev gelê wî yên nebawermend têkçûn. Di pey ra Xweda ferman da kaniyên zemînê ku êdî ji hilavêtina avê rawestin û ferman da asîman ku êdî baranê rawestîne. {**Got erdo! Ava xwe daqurtîne û asîmano! Paşva vekişe. Av çû, her tişt temam bû û li ser Cûdî rawestiya û got ew gelê zordar bila bi têkbiçe**.}

**{وَقِيلَ يَا أَرْضُ ابْلَعِي مَاءكِ وَيَا سَمَاءُ أَقْلِعِي وَغِيضَ الْمَاء وَقُضِيَ الأَمْرُ وَاسْتَوَتْ عَلَى الْجُودِيِّ وَقِيلَ بُعْداً لِّلْقَوْمِ الظَّالِمِينَ}**[1]

## Şîrovekirina çîroka Tofanê ya qur'anî:

Evin bûyerên çîroka *Tofanê* ya qur'anî. Keştî li ser çiyayekî bi navê "Cûdî" rawestiya. *Nûh* û kesên ku li gel wî bûn rizgar bûn û hemû kesên din ji gelê wî têkçûn. Ji gotûbêja Qur'anê tê fêhmkirin ku *Tofan* ne cîhanî bûye; ew tenha girêdayî gelê *Nûh* bi taybetî bûye. Ji ber ku ayet dibêje: {**Me Nûh şand ji gelê wî ra ku hawar bike û bala wan bikişîne, pêş ku azareka dijwar tê serê wan**}[2]. **{إِنَّا أَرْسَلْنَا نُوحًا إِلَى قَوْمِهِ أَنْ أَنذِرْ قَوْمَكَ مِن قَبْلِ أَن يَأْتِيَهُمْ عَذَابٌ أَلِيمٌ}** Gotina "gelê Nûh" di ayetên qur'anî din da jî tê dubarekirin, yên ku peywendiya xwe bi çîroka *Tofanê* ra hene.

Lê belê, *Nûh* û gelê wî li kû rûniştibûn? Em bersiva vê pirsê ne di Tewratê da û ne jî di Qur'anê da dibînin. Tenha îşareteka bi sînor di Qur'anê da heye ku gelê *Nûh* kufir bi Xweda kirine û hin pût wek Xweda ji xwe ra girtine {**Gotin xwedayê xwe neperêsin li tenişt perestina Wed, Suwa', Yexûs, Ye'ûq, Nesr**}

**{وَقَالُوا لَا تَذَرُنَّ آلِهَتَكُمْ وَلَا تَذَرُنَّ وَدًّا وَلَا سُوَاعًا وَلَا يَغُوثَ وَيَعُوقَ وَنَسْرًا}**.[3]

Li vir şîrovekarên Qur'anê xwe dixin nava mijarê û valahiya vê pirsê û pirsên din ku agahdariyên xwe jê birine bê bersiv dihêlin. Lê belê tê xuyakirin ku wan hin caran arîkarî ji gotûbêjên di bermaya îsraîlî da birine. Hin şîrovekaran gotine ku pûtên "**Wed, Suwa', Yexûs, Ye'ûq, Nesr**" kesayetiyên navdar bûn di nav gelê *Nûh* da, û piştî mirina wan, hin peyker ji wan ra durist kiribûn daku mezinahiya wan bi bîrbînin. Bi derbasbûna demê ra, nifşên piştî wan bawer kirin ku ew peyker xwedawendin û wisa jêra perestî kirin. Dîroknas û şîrovekar Ibin Cerîr El Tabari **ابن جَرير الطَّبَري** gotiye ku ew pût li welatê Ereban bûn[4].

Hin ji tiştên hûrik ku Al Tabarî jî anîne ewin ku bilindahiya keştiyê 30 gaz bûye; ew ji sê qatan pêkdihat: Qatê jorîn ji bo tilûran, yê navîn ji bo mirovan û yê jêrîn ji bo bo jîndar û lawirên hovî bû. Û dibêje ku ew di Ke'beyê ra derbas bûye, heft caran pê tewaf kiriye. Ji ber ku Xweda Ke'be bilind kiribû ku ew nekeve bin avê. Di pey ra keştî çûye Yemenê, paşê vegeriyaye û di roja Aşûra عاشوراء da li ser çiyayê Cûdî rawestiyaye. El Tabarî jî gotiye ku pêximber *Nûh* qirik şandiye ku li avê temaşe bike. Qirikê termek (laşeyek) dît û li ser daket. Di pey ra *Nûh* kevokek şand; wê pelên zeytûnê jêra anîn. Ibin Ebi Hatem **ابن أبي حاتِم** di şîrovekirina xwe da piraniya tiştên ku di çîroka *Tofanê* ya tewratî da hatine, tîne ziman. Yek ji wan ewe ku dema keştî li ser çiyayê Cûdî rawestiyaye, *Nûh* û yên li gel wî daketine kuntara çiyayê Cûdî û gundê yekem piştî *Tofanê* bi navê Heştî * avakirine; ji ber ku 80 kes bi *Nûh* ra hebûn[5].

* Gundê Heştan heya niha jî li kuntara çiyayê Cûdî heye. Melayê evîndar yê bajarê Şernexê hat û Eyşana Elî ji vî gundî revand. Strana Mihemed Arif Cezrawî ku li ser "Eyşana Elî" distirê li ser vê bûyerê ye (Wergêr).



Dîmenek ji çiyayê Cûdî

## Nasnameya çiyayê Cûdî çi ye?

Di rastiya da, Qur'anê cihê vî çiyayî negotiye. Tewratê jî cihê çiyayê Ararat negotiye. Wek adeta wan, şîrovekar ketine nava vê mijarê û hewldane ku tiştên hûrik bêjin. El Tabarî û Mujahid مُجاهِد gotine ku "**Cûdî li Cizîrê ye**". Û dema ku *Tofan* pêkhatiye, hemû çiyan bi kopên xwe, xwe bilind kirine daku nekevin bin avê. Çiyayê Cûdî nefsbiçûk bû, Xweda ew xerq nekir û keştiya *Nûh* li ser wî rawestiya[6].





Şîrovekarên Qur'anê û zanyarên erdnîgariyê yên Misilmanan yên kevin li ser wê yekê li hev dikin ku çiyayê Cûdî di axa Cizîrê da ye. Ibin Ebî Hatem gotûbêjekê dibêje ku kurtahiya wê eve: Hin şêxên ji êla Ebs عَبْس ya erebî di şerê Siffînê صِفّين da, ew şerê ku di navbera Ali Bin Ebi Talib عليّ بن أبي طالب û dijberê wî Muawiye Bin Ebî Sufyan مُعاوِيَة بن أبي سُفْيان, serdarê Sûriyayê da pêkhat, beşdar bûbûn. Ew bi serdanî çûn çiyayê Cûdî û cihê keştiya *Nûh* dîtin. El Bexewî di şîrovekirina xwe da dibêje ku çiyayê Cûdî di axa Cizîrê da, li nêziya Mûsilê ye. El Razî jî di şîrovekirina xwe da dibêje ku Cûdî li Cizîrê ye[7].



Dîmenekî din ji çiyayê Cûdî. Tê gotin ku ev dirûvê di çiyayî da mîna keştiyan ji bermayê keştiya Nûhe. Lê em bawer dikin ku diyardeyeka surîştî ye

Erdnîgarînas Al Meqdisi dibêje ku "**bajarê yekem li Cizîra Botan hatiye girtin, bajarekî mezin, av ji sê aliyan va li dora wî digere û Dijle di navbera wî û çiyan da ye. Ev bajarekî xweşe, avahiyên wî ji kevirin**". Yaqût El Hemewî jî dibêje: "**Al Cûdî: Ev çiyayeke li hafa Cizîra Botane, li aliyê rojhilat yê Dijleyê, li derdorên Mûsilê ye. Li ser wî keştiya Nûh eleyhî selam rawestiyaye**"[8].

Erdnîgarînas El Bakrî El Andalûsî gumanê têda nahêle ku Cûdî di erdnîgariya Kurdistanê da ye. Ew dibêje: "**Ji nifşên Kurdan: Al Şûhecan û Macirdan û Mazincan û Kîkan û Barsan (Parsan? Barzan?) û Mistekan û hinên din. Ew di axa El Deynûr, Hemedan, welatê Azerbeycan, welatê Şam û di axa Mûsilê da ne heya çiyayê Cûdî. Ev kes Kirîstiyanin li ser ola Ye'qobiye**"[9]. Ji gotinên El Bakrî (1094 z. miriye) tê fêhmkirin ku hebûna Kurdan li welatê Şamê (Sûriya) ji kevin da ye û hinek ji Kirîstiyanên Cizîrê ku xwe vedigerînin ser Suryan û Aşûriyan, ew ji aliyê neteweyî va, bi koka xwe Kurdin.



Dawiya mijarê ewe ku "Cûdî" çiyayekî kurdistanî ye, li herêma Botan, li nêziya Cizîra Botan dikeve. Bi herhal, peywendiya navê vî çiyayî bi liqekî ji pêşiyên Kurdan ra heye. Ew jî liqê "Gotî, Cûtî, Cûdî" (Guti) ye. Welatê pêşiyên Kurdan di sedsalên 23 û 22 b.z. da bi navê wan dihate naskirin. Ji ber ku wan padîşahiya Akkadî li Mêzopotamiyayê hilweşand, û di wê demê da bûn serdarên rojavayê Asiyayê, û wisa navê wan di navê çiyayê "Cûdî" da maye[10].

Çarşembe, 22.07.2015

## Jêder


[1] Li sûreyê Hûd binêre, ayet 25-45. sûreyê El Mu'minûn, ayet 24-30. Sûreyê El Şû'eraa, ayet 105-121 û sûreyê Nûh, ayet 1-28.
[2] Sûreyê Nûh, ayet 1.
[3] Sûreyê Nûh, ayet 23.
[4] Şîroveya El Tabari, 23/639.
[5] Şîroveya ElTabari, 15/335. Şîroveya Ibin Ebi Hatem, 5/1507, 6/2038. Şîroveya ElQurtubi 2/53. Şîroveya Ibin Kesir 4/281. Li El Ezreqi temaşe bike, nûçeyên Mekke, 1752.
[6] Şîroveya ElTabari 15/337. Şîroveya Mujahid, rûpel 388. Şîroveya ElAlosi 6/270.
[7] Şîroveya Ibin Ebi Hatem 6/2037. Şîroveya Al Baẍwi 2/451. Şîroveya ElRazi 17/354.
[8] Yaqot ElHamawi, Ferhenga welatan, 2/179. ElMaqdisi, baştirîn beşkirin ji bo naskirina herêman, rûpel 139. Li Ibin Xudube temaşe bike, ElMesalik we ElMemalik, rûpel 76.
[9] ElBakri Al Andalusi, ElMesalik we ElMemalik, 1/344.
[10] Diyakonov, Midia, rûpel 109, 110, 117. Arshak Safrastiyan: Kurd û Kurdistan, rûpel 37. William Langer, Berfirtehiya dîroka Cîhanê, 1755. Muhemmed Beyyumi Mehran, Dîroka Îraqê ya Kevin, rûpel 162-163. Cemal Reşîd Ehmed, Xuyakirina Kurd di Dîrokê da, 1/547, 552.